NSW GOVERNMENT

**School counselling service**
Information for parents and carers

# Xizmeta şêwirmendiya dibistanê

## Agahdarî ji bo dê û bav û çavdêran

Hemû dibistanên dewletê yên NSW'ê dikarin xwe bighînin alîkariya pîskolojîk bi xizmeta şêwirmendiya dibistanê.

Di xizmeta şêwirmendiya li dibistanê de şêwermendin dibistanê, psîkolojên dibistanê hene û ew şêwirmendiyê didin, nirxandina pîskolojî û xizmetên têkilîkirinê didin ji bo xwendekarên pola 12. Ew bi malbatan, karmendên dibistanê û kesên fin yên profîsyonal re kar dikin ji piştgiriya xwendin, tendirustiya derûnî, û pêdiviyên başbûna xwen

Hemû karmendên şêwirmendiya dibistanê xwendina wan ya bilind di derûnnasiyê de heye û ew pisporiya xwe di warê tendirustiya derûnî, fêrbûn û reftarê de bi cîh dikin da ku alîkariya zarok û ciwanan bikin ku bi awayekî akademîk, civakî, reftar û hestyarî bi ser bikevin.

Şêwirmendê dibistanê an jî psîkolojê dibistanê dikare:

- şêwirmendiyê bidin xwendekaran
- fêrbûna xwendekaran û pêdiviyên tenduristî yên derûnî binirxînin
- bi mamoste û karmendên pispor re bi hevkarî bixebitin
- alîkariya malbatan bikin ku fêrbûna zarokên xwe û pêdiviyên tenduristî yên derûnî fêm bikin û bi rê ve bibin
- bi ajansên derve û pisporên tendirûstiyê yên derûnî re têkilîyê deynin da ku ji bo xwendekarên takekesî piştgiriyeke rêkxistî, paşîn pêk bînin.

Dema ku hûn bi xwendekar, dê û bav û karger û mamosteyan re bixebitin, karkerên şêwirmendiyê yê dibistanê wê nîşan bidin ka ew çawa dixebitin, bi baldarî guh bidin gotinên wan, alîkariyê die ku vebijarkan zelal bike û biryarên agahdariyê palpişt bike.

## Nepenî

karmendên şêwirmendiya dibistanê ji bo xwendekaran alîkariya psîkolojîk a dilxwaz û nepenî didin. Bêyî destûra xwendekar, dê û bav an jî çavdêr agahiyên veşartî bi kesên din re nayên parvekirin, lê belê tenê dema ku ji hêla yasayê ve hatin xwestin an jî rê li ber rîska cidî ya ewlehî yan jî tendirûstiyê.

## Hinartin

Pêşiyên piştgiriya şêwirmendiya dibistanan di şêwirmendiya tîmên fêrbûna dibistanan û tenduristiyê de diyar dibe. Dê û bav an jî çavdêrên ku ji bo fêrbûna zarokê xwe, tenduristîya derûnî û/an jî ji bo tendirûstîya wan xemên wan hene, dikarin bi rêya têkiliyê bi dibistanê re hevdîtinekê bixwazin. Xwendekar her wiha ji bo hevdîtinê dikarin ji dê û bavan an jî xebatkarên hînkirinê alîkarî bipirsin ji bo ku hevdîtinekê bixwazin.

## Xizmeta wergêrên li ser telîfonê

Heger hûn agahiyên zêdetir bixwazin ji kerema xwe li dibistanê bigerin. Heger ji bo alîkarîya lêpirsîna we hewcehîya we bi wergêrekî hebe, ji kerema xwe di 131 450 de li Xizmeta Wergêran li ser Telîfonê bigerin û bi zimanê xwe wergêrekî bixwazin.

Ji operatorê re hejmara telîfonê ya ku hûn dixwazin lê bigerin bibêjin û ji bo ku di axaftinê de bibe alîkar wê operator li ser xetê wergêrekî bistîne. Ev xizmet belaş e.